



Efrîn di bin dagîrkeriyê de (185):

Gundê "Keferzîtê" - desteserkirina li ser malmewalan û qutkirina daran, girtinên bêşûcane, pevçûnên di navêna "Ehrrar Elşam" û "Elhemzat" de, wêrankirina daristaneke xwezayî



Ta niha Hikometa Anqerê û Hemahengiya Sûrî - Ixwanî virûvûtan dikin û dibêjin Herêma Efrînê aram e, bi ser ku kiryarên rojane ji bînpêkirin, tewan, tunebûna aştî û aramiyê û pevçûnên milîseyan berdewamkirî ne. Emê jê van belge bikin:

= G. "Keferzîtê":

Bi navça Navenda Efrînê ve girêdayî ye, /13/KM jê dûr e, ji dora /175/malî pêkhatî ye, dora /1200/nişte ji nişteciyên Kurd ên Êzdî û Misilman tê de bûn, di dema dijberiya ser herêmê de tev penaber bûn, dora 90% jê vegeirîn, û dora /1000/ nişte ji anîndeyan -perwerdekerê pêz û dewêr û pîranî di konan de li dor gund- tê de hatin nişteçêkirin.

Milîseyên "Firqit Elhemzat" gund desteser kirin, û herdu Vêlên "Ebdo Xilo" û "Elî Şan" kirin biryargehên leşkerî, dest danîn ser malên hêmwelatîyên ku ne li gund tevî tiştmiştên tê de, û ji malên din jî xwarinvexwarin, firaxên baqirî, cerên gazê, alav û amûrên elektrîkê û hin tiştên din dizîn, herweha jî dizîna

guheztok (tirans) û keblên toreyâ elektîrîkê ya giştî, keblên voltaca bilind ên ji çateriya Gundê "Tilifê" yê hevçîwar de dirêjkirî, keblên toreyâ telîfûna zemînî tevî kebla wê ya serekîn a ku ji heman çateriyê de dirêjkirî, û hejmarek ji otombîl û tirektorên çandiniyê - yên ku hatin vegerandin piştî dandina xwediyên ji vêrgiyên diravî re. Û bûyerên dizîna malmewalên nişteciyên resen ta roja îro dubare dibin.

Û weha jî wan dest danîn ser avahiyên herdu guvêşgehên zeytûna yên "Dilovanber Osman Isma'îl" û "Ebdo Xilo", Sûtemengeha (kaziya) "Elî Şan" li Bajarê Efrînê, û dora /7/hezar darên zeytûnê yên malbatên "Xilo, Şan, Gulê Xeyrî...HWD", vêrgiyên têkel li ser werzên (mûsim) zeytûna yên nişteciyên mane ferz kirin, û bi ser de jî dizîna zeytûna.

Weha jî ji bo êzingirin û bazirganiyê bihezaran darên zeytûnê û dora /50/ darên çinarê -yên ku weke zaretgeh û ciyên geştiyariyê bûn- bi rengekî hovane û bêwijdan qut kirin; Û çêrandina bêwijdan ji keriyên pêz re jî di nav zeviyên zeytûna û erdên çandiniyê de heye, bê ku tu kes wêribe qedexe bike yan li dijî perwerdekeran gilî bike, û di vî warî de wek nimûne temenmezin "Elî Hiso/70/sal" carekê rastî lêdaneke mekin û kêmrûmetkirinê hat, ji ber ku li ser çêrandina pêz di nav zeviyê wî de nerazîbûna xwe xuya kir.

Xelkê gund jî rastî cûrbecûr bînpêkirinan hatin, mîna revandin û girtinên bêşûcane, îşkencekirin, rûmetdaxistin, peresitandin û hin tiştên din, û bi tewanbariyên çêkirî bidehan hatin girtin tevî ferzkirina baceyên diravî, û wek nimûne: Ji navîna sala 2018an ve û ta niha hemwelatî "Ebid Elrehman Mihemed /40/sal" zorane veşrtî û çarenûs wendayî ye.

= Girtinên bêşûcane:

Destlatên Dagîrkeriyê ev girtin:

- Ji sê heftan ve ev hemwelatî "Edîb Mihemed Şeref/45/sal, Kemal Elî Hebîb/42/sal û Ehmed Hemîd Hebîb /43/sal" ji xelkê Gundê "Şadêrê" - Şêrewa, bi tuhmata têkelîyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re, ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Cindirêsê" ve, û piştî çar rojan ji girtinê yê dawiyê berdan, û herdiwên mayîn jî li 31.1.2022an Z, piştî îşkencekirinê; Û di heman demê de jî, Milîseyên "Feyleq Elşam" hemwelatî "Mihdîn Koco/45/sal" ji heman gundî revandin, di hepsa xwe ya taybet li Gundê "Îska" yê hevçîwar de -tevî Pîkaba wî ya Honday- bend kirin, û ta niha çarenûsa wî ne diyar e.

- Li 31.1.2022an Z, hemwelatî "Mihemed Hesên Hemreş/40/sal" ji xelkê Gundê "Etmana" - Navça Reco li Bajarê Efrînê, ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" ve, piştî ku wî daxwaza kiriya mala birayê xwe li Taxa Eşrefiyê ji desteserkiriyekî kir, û wî jî bi tewanbariya girêdanê bi Partiya Yekîtî ya Demokrat (P.Y.D) re giliyek lê vekir, û piştî çar rojan hate berdan.

- Li 7.2.2022an Z, hemwelatî "Fexrî Şêxo Qenber/50/sal" ji xelkê Gundê "Gemrûkê" û hemwelatî "Menan Se'îd Şêx Seydî /48/sal" ji xelkê Gundê "Şêxûtka" - Navça Mabeta, ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Mabeta" ve, bi tuhmata têkelîyê bi R.X a berê re, û herdu birin Efrînê, û piştî ferzkirina /1200/ PT li ser her yekî ji wan li 10.2.2022an Z hatin berdan.

- Li 8.2.2022an Z, ev hemwelatî "Ehmed Mistefa kurê Ce'ifer /54/sal" û "Kemal Ce'ifer kurê Reşîd /48/sal" ji xelkê Gundê "Qota" - Navça Bilbilê, ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Bilbilê" ve, bi tewanbariya têkelîyê bi R.X a berê re, û ta niha çarenûsa wan ne xuya ye.

= Bêserûberî û serberdayetî:

Li 12.2.2022an piştî nivro, di navêna Milîseyên "Ehrrar Elşerqiyê" û "Firqit Elhemzat" de, li Gundê "Gewrika" û derdora Gundên "Feqîra" û "Çolaqa" - N.Cindirêsê, bi sedema nelihevkerinê li ser çarçewa bandoriyê û tiştmiştên dizînê, pevçûnina rûdan, û di encamê de, endamin ji herdu aliyan hatin kuştin û birîndarkirin, hersê gund hatin dorpêçkirin, û tirs kete nav xelkê; Û ta niha gizgizî li dar e, xelk hate hişyarkirin ku ji malên xwe dernekevin, û hin milîseyên din jî ji bo piştgiriya herdu aliyan ketine tevgerê.

= Wêrankirina daristanan:

Bi beramberkirina du wêneyên ku ji aliyê Gogêl Êrs ve ji daristaneke xwezayî re ye ku bi bergeha /60/hiktarî- Bakur Rohilatê Gundê "Tetera" - Navça Cindirêsê li (Rezbera sala 2017an Z berî dagîrkeriyê û qutkirinê, Tebaxa 2020an piştî dagîrkeriyê û qutkirinê) hatiye kişandin, bi ser de jî qurkirina berdewam a ji

dora du sal û nîvan ve û ta roja îro, û li gor nûçeyên xwecihî, diyar dibe ku ew daristan ji aliyê milîseyên bi ser Turkiyê ve, ji bo êzingirin, çêkirina komirê û bazirganiyê, bi tevahî û tamamî hatiye wêrankirin û qirkirin.

Ew kiryar û heyînên te'îl deriyan li pêş vegereke xwebexş û aram ji koçberên Efrînê re digre, û zextê jî li ser nişteciyên resen ên mane jî dike, da ku zorane koçber bibin.

13.02.2022an

Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn
Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê

Wêne:

- G. "Keferzîtê".
- Avahiya guvêşgeha zeytûna ya "Ebdo Xilo" a desteserkirî - G. "Keferzîtê".
- Du wêneyên daristaneke xwezayî, Bakur Rojhilatê G. "Tetera" - N.Cindirêşê (Rezbera sala 2017an Z berî dagîrkeriyê û qutkirinê, Tebaxa 2020an Z piştî dagîrkeriyê û qutkirinê).